# Mereqa li ser Fîlî

Nivîsîna: Îngegerd û Sven Zetterlund
Wêne: Yohanna Zetterlund
Wergera ji swêdî: Xelîl Duhokî

Tût!
Ez li vêre me! Navê min têmboye û têşkekî biçûk û nêrim ku li efirîqa dijîm.
Niha ez dê ji bo te, basî me an kim.
Erê te dizanî ku em mezintirîn candarên welatî ne? Erê; dibe niho ne, lê rojek dê hêt ku wek babê xo mezin bibim. Hîngê wek çar tirumbêla giran dibim û ez dê gehim cihên bilind ku serê min bi banê odeyekê bikeve. Belku ji wêderê jî bilindtir!
Ji malbata min, em nêzîkî bîst fîlayne. Deyka min, metên min, dotmam û pismamên min. Her wesa xwîşka min ya mezin, ku hemî dema karên hûrik dike û çavdêryê jî li min dike. Babê min diçe û carina jî dûr dikeve.
Ew bi tinê hindek caran tê û silavê li me dike.
Em jî, têşkên fîlan, wek we mirovan, ta ku bibîne çar salî, şîrxorîn. Memkên deyka me nêzîkî destan e. Dema ez birisî dibim, limûza xo ji bo paş ve dibim û bi devê xo şîrî dimêjim.
Fîlên mezin, pûşupelexî, şitil û gîyayî dixon. Belê, hema çi tiştê şîn dibe. Eger xarin li ser erdî nemîne, hîngê ew darên mezin radikêşin, da ku bigehine tak û çiqên gopîtka. Helbet ew doruber di pîsatyê de dimînin û gokên rîxê li her derê di belavene.
Çaxê fîlên mezin têhinî dibin, ew di yek carê de, dikarin bi qasî teştekê avê vexon. Lê carina ava rûbaran bi dîmahî tê, hîngê ew bi limûzên xo, li cihê herî xarê yê rûbarî, çaleka kûr dikolin û yek, du, sê, biliqên avê ser dikevin!
Bawer bike, limûza min şareza û jîre. Cara yekê min ne dizanî wê bikar bînim. Ew bi min ve helawîsitî bû, dihat û diçû, carina ez disetmîm jî! Niho ez fêrbûyme ku bi limûza xo bêhn bikim û gîya û gula jî têkivedim. Her wesa ez bi rêya wê dikarim, avê rakêşim û bikime di devê xo de.
Em fîl dema silavê li hevdu dikîn, limûza xo bikar tînîn. Dîsan dema ez dinivim, limûza xo dikime di devê xo de û wek tibleka mezin dimêjim. Ji bo ku dilê min xoş bike, carina deyka min limûza xo, wek memkekê lasitîkê, dixe devê min.
Ew cihê em lê dijîn pir germe. Ji lewre jî, ber bi rûbaran diçîn û Melevanîya dikîn. Lê em hemû caran bi sanahî nagehîne wan deran. Li hindek cihan, rexên rûbaran diherfin û hîngê em li ser paşîyan, xo dixuşînîn nav rûbaran. Li wêrê palddîn û bi tinê limûzên xo li ser avê dihêlîn û bi dilxoşî diborînîn.
Em têşkên fîlan gelek dileyizîn. Em bi harîkarîya limûzên xo, hevdu digirîn û dikêşîn. Enyên xo lêk didîn widkîn"şong" û paşî yên dî jî, berdewam dibin. Yarîyeka dî ya xoş heye ku bi hevre hawar dikîn, yan jî di golekê de, palddîn û bi tevayî di herî û teqnê werdbîn.
Li vêre li efirîqa, gelek candarên dirinde jî hene, bo nimûne şêr, zirafe û kerikeden. Her wesa hejmareka zûr ji kerekîvî û xezalan jî hene. Lê em fîl, ji tevayan bi hêztir û mezintirîn. Ji lewre jî, em di tenahyê de dijîn û me çi tirs ji candarên goştxur nîne.
Nexêr, niho min divê bêhnekê razêm. Êvare û dê tarî bibe. Evcar ez dê xo dirêjikme tenîşt dîya xo, bawîşka vedim û limûza xo jî êxme devê xo. Bextekê baş e ku em li nêzîk pencera te nanivîn, çinku em tevaya fîlan ji bo tiştekî di jîrîn ku: Pirxe pirxê bikîn!
Xoş binive!